
# Afirandin




Published by the Comic Bible Society, LLC
Copyright © 2021

Kingstone Comics maintains copyright to this comic book as provided by United States copyright law.

Print and digital copies of this version may be freely distributed without penalty under a Creative Commons license.


Di destpêkê de – heta berî ku dem were afirandin – Xwedê hebû.
Ew di sê kesan de hebû – hevyeksan – hev-her-heyî lê yek di gewher de.
Xwedê ne bi tena serê Xwe bû – Wî bi Xwe re di hezkirina ya lihevhatî de bû.
Piştre Ew bû...ku erd û ezman afirandin.


Xwedê got: "Bila ronahî çêbe,” û ronahî çêbû.
Xwedê dît ku ronahî qenc e û Wî ronahî ji tariyê veqetand.
Xwedê navê ronahiyê “Roj” û yê tariyê “Şev” danî. Bû êvar û bû sibe, ev roja pêşî bû.
Xwedê got: “Bila di navbera avan de qûbeyek çêbe, da ku avan ji hev veqetîne.”
Îcar Xwedê qûbeyek çêkir û ava li bin qûbeyê, ji ava li ser veqetand. Wisa jî çêbû. Xwedê navê qûbeyê “Ezman” danî.




Destpêkirin 1:3-8


Xwedê got: “Bila ava di bin ezman de li derekê bicive û bejahî bê dîtin.”
Û wisa jî çêbû. Xwedê navê bejahiyê “Erd” û navê ava civiyayî “Derya” danî.
Xwedê dît ku ev qenc e.
Piştre Xwedê got: “Bila li erdê giya û şînahiyên xweyî ber û dar çêbin û li gorî cureyên xwe ber û fêkî bidin.” Wisa jî çêbû.


Erdê, giya û şînahiyên ku li gorî cureyên xwe ber didin û darên wiha gihandin ku berê wan di fêkiyê wan de ne.
Xwedê dît ku ev qenc e.
Bû êvar û bû sibe, ev roja sisiyan bû.
Destpêkirin 1:9-13


Di roja çaran ji hefteya afirandinê de, Xwedê roj, heyv, stêran û gerdûneke mezin afirandin.
Xwedê got: “Bila di qûbeya ezman de ronahî çêbin, da ku roj û şevê ji hev veqetînin û ji roj, demsal û salan re bibin nîşan. Bila ev di qûbeya ezman de bibin ronahî, da ku ronahiyê bidin erdê.”
Û Wisa jî çêbû. Xwedê du ronahiyên mezin çêkirin: Ya mezin ji bo ku serweriyê li rojê bike, ya biçûk jî ji bo ku serweriyê li şevê bike. Wî stêr jî çêkirin.


Xwedê ew di qûbeya ezman de bi cih kirin, da ku ew ronahiyê bidin erdê, serweriyê li şev û rojê bikin û ronahî û tariyê ji hev veqetînin.
Xwedê dît ku ev qenc e.
Bû êvar û bû sibe, ev roja çaran bû.



Di roja pêncan ji hefteya afirandinê de, Xwedê deryayan bi afirîdên jîndar tije kirin.
Xwedê got: “Bila av kerî bi kerî bi afirîdên jîndar tije bibe û bila li ser erdê, li qûbeya ezman teyr bifirin.”
Xwedê hûtên deryayê yên mezin, hemû keriyên jîndar ên ku di avê de tev digerin û teyrên ku difirin li gorî cureyên wan afirandin.


Xwedê dît ku ev qenc e.
Xwedê ew pîroz û bereket kirin û got: “Zêde û berdar bin, ava deryayan dagirin. Bila teyr li erdê zêde bibin.”
Bû êvar û bû sibe, ev roja pêncan bû.
Destpêkirin 1:20-23


Di roja şeşan ji hefteya afirandinê de, Xwedê heywanên erdê afirandin.
Piştre Xwedê got: “Bila erd li gorî cureyên wan afirîdên jîndar, heywanên kedî, afirîdên ku bi erdê ve dişêlin û heywanên kovî derîne.”


Wisa jî çêbû.
Xwedê jiyana siruştî li gor cureyên wan heywanên kovî, kedî û hemû cureyên dişêlin afirandin.
Xwedê dît ku ev qenc e.
Destpêkirin 1:24-25


Di roja şeşan de, Xwedê afirîdekî nû ji axa erdê çêkir.
Xwedê Adem ji axa erdê çêkir û hilma jiyanê pif kir pozê wî. Bi vî awayî Adem bû canê jîndar. Li ser hemû heywanan, Xwedê Wî di sûretê Xwe de afirand.
Xwedê navê afirîdê nû Adem danî.
Xwedê hemû tiştên çêkiribûn dît û got: “Ev pir qenc e.”




Destpêkirin 2:4-15



Di navenda bexçê de du dar hebûn. Yek dara jiyanê bû – ku jiyana herheyî peyda kir. Ya din dara zanîna qencî û xerabiyê bû.
Xudan ji Adem re got ku ew dikare ji her dara bexçeyê bixwe – Lê Wî herwiha hişyariyeke giran da wî...


“Ji dara zanîna qencî û xerabiyê nexwe. Çimkî gava tu jê bixwî, bêguman tê bimirî.”
Destpêkirin 2:9, 16-17







Destpêkirin 2:19-20




Destpêkirin 2:18-24


Û Wî wê da Adem.
Ew di her awa de jê re temam û tekûz bû.
Adem navê jina xwe ya nû û bedew Hawa danî.


Xwedê wê ji mirov re anî – Di wê yekê de, Xwedê daweta pêşî pêk anî.
Adem ji ber bedewiya wê û diyariya neravebar ku Xwedê jê re peyda kiribû hat helandin.


Îcar Îblîs, yek ji milyaketên ketî, kir ku tevdîra Xwedê ya mezin wêran û xerab bike.
Ew nêrî û li benda fersendekî sekinî ku karê Xwedê yê baş xerab bike.
Hingê wî marekî anî li bexçeyê û bi rêya wî bi Hawa re axavî.
Tiştê pêşî ku kir, wî jê pirskir ku Xwedê çi ji wan re gotibû.
Ma bi rastî Xwedê got: “Divê hûn ji tu dareke bexçê nexwin?”
Hawa baş dizanî ku Xwedê çi ji wan re gotibû û wê gotina Xwedê dîsa ragihand.
Em dikarin ji fêkiyên darên li bexçê bixwin; lê Xwedê got: ‘Divê ku hûn ji fêkiyê dara li navenda bexçê û dest nedinê yan na hûn ê bimirin.’


Hingê Îblîs dereweke mezin got û wê kir ku der qencî û kesayetiya Xwedê bipirse.
Hûn qet namirin.
Çimkî Xwedê dizane gava ku hûn ji wê bixwin, wê çavên we vebin, hûn ê bibin wek Xwedê û bi qencî û xerabiyê bizanin.
Fêkiyê darê çêjdar e... û baş xuya dike.
Li ser wê, ez dikarim zanînê bi dest xwe bînim...
Ka bibîne, ez nemirim. Tu jî biçekî bixwe – da ku tu jî hişyar û biaqil bî.


Min çi kir?!
Oh na!
Di wê gavê de, Adem û Hawa bi şermê di cara pêşî de zanîn – Bi rêya gunehkirinê li dijî emirê Xwedê yê tije hezkirin.
Min tu car bi vê yekê qet nehesiye!
Ez dihesêm ku ez qirêj û rûreş im.
Adem û Hawa pelên hejîran bi hev ve dirûtin ku xwe û tazîbûna xwe biniximînin.
Çaxê ew bihîstin ku Xwedê di hênikahiya rojê de, di nav bexçê de digere, ew revîn û xwe veşartin.


Tu li ku derê yî?
Min li bexçê tu bihîştî û ez tirsiyam, çimkî ez tazî bûm û min xwe veşart.
'Kê ji te re got ku tu tazî yî?
Ma te ji wê dara ku min ji te re gotibû "Jê nexwe" xwar?
Wê jinika ku te dabû min, fêkiyek ji wê darê da min û min jî xwar.
Ev çi ye ku te kir?
Mar ez xapandim, wî ji min re got ez ê nemirim – û ez ê bibim mîna te.
Wî min derew kir...
Ji ber ku te ev yek kir, wê di nava hemû heywanan de, yê herî bi nalet tu bî – Tê li ser zikê xwe bişêlî û di hemû rojên jiyana xwe de axê bixwî.
Ez ê dijminatiyê bikim navbera te û jinê,...
...nav ziriyeta te û ya wê.
Ew ê serê te biperçiqîne û tê jî êrîşî pehniya wî bikî.
Xwedê karî ku Îblîs û hemû milyaketên wî wêran bike, lê Wî wan hişt bijîn da ku ew yeka bibe ceribandinek ji bo mirovan – ku binêre kê pê Xwedê here – û kê pê Îblîs di serhildana xwe de here.
Li vir Xwedê soz dide ku şerekî di paşerojê de çêbe dema ku wê neviyê jinikê marê têk bibe – û mirovatiyê ji naleta guneh û mirinê rizgar bike.


Îcar naleta gunehê di nijada mirovî de çalak û zindî bû.
Gava zarokanînê ez ê êşa te gelekî zêde bikim û bi êş tê zarokê xwe bînî.
Wê hewcedariya te ji mêrê te re hebe lê ew ê serwerê te be.
Ji ber ku te guhdariya jina xwe kir û ji wê dara ku min ji te re gotibû, “Divê tu nexwî,” te xwar, ax ji rûyê te bi nalet bû…
Tê di hemû rojên jiyana xwe de bi zehmetî jê bixwî.
Wê ax stirî û diriyan bide te.
Tê nanê xwe, bi xwêdana eniya xwe bixwî, heta ku tu bizivirî wê axa tu jê hatî çêkirin...
Çimkî tu ax î û tê bizivirî axê.
Di dîroka mirovan de, xwînrêjiya pêşî ew bû dema ku Xwedê du hewyan kuştin ku bi çerma wan bikar bîne û li ser mirovên ketî bigire.
Ev ravekirina grafîk bû ku tenê Xwedê dikare gunehê baş biniximîne û xwînrijandin di vê karê de beşek pêwîst e.
Di vê yekê de Kitêba Pîroz nêrîneke din der serê Xwedê dide me – Wek ku Xwedê di sê kesan de der tiştên ên çêbin dipeyve.
Niha Adem bû yekî mîna me, çimkî êdî bi qencî û xerabiyê dizane.
Divê niha ji bo wî destûr neyê dayîn ku destê xwe dirêjî fêkiyê dara jiyanê bike, jê bixwe û her û her bijî.


Bi vî awayî Xudan Xwedê wan ji Bexçê Adenê derxist.
Wî nexwest ku ew jiyaneke herheyî tev rewşa wan a gunehkirî bijîn.
Piştî ku Wî wan ji Bexçê qewitand, Wî milyaketeke bi şûrekî agiravêj bi cih kir da ku ew riya dara jiyanê biparêze.




Destpêkirin 3:23-2






Destpêkirin 2:5, 4:1-2




Destpêkirin 4:2-4






Destpêkirin 4:6-8




Destpêkirin 4:9-16






Destpêkirin 4:17-22; 5:24


Xwedê kurekî din – Şêt – da Adem û Hawa, di cihê wî kurî ku hat kuştin.
Bi rêya ziriyeta Şêt, wê rojeke Xilaskarê yê çaverêkirî yê Xwedê – Mesîh – were.
Di nav van nifşên pêşî de, civak û çandeyan destpê bi mezin bûnê kirin.
Lê wek ku gel zêde bûn...guneh jî zêde bû.
Hinek hebûn ku destpê bi gazîkirina dilovaniya Xwedê kirin – Bi hêviya peywendiyeke vegerandî.


Pir kes ji wê civakê gelek zordar bûn – û gel bû bêsinc û bêexlaq.
Hesinên ku bûn amûr li ser şikilê çekan hatin çêkirin ku birîn bikin û bikujin.
Her nêrîneke gunehbar bû û tu kes bi awayekî rast jiyana xwe derbas nekir.
Mirov mirovên din kirin kole.
Adem gunehek yek kir – lê niha ziriyeta wî gelek gunehan çêkirin.
Xudan ji bo afirandina mirovan poşman bû – û dilê Wî êşiya.
Xwedê – ku pîroz û bê kêmasî ye – bi xerabiya mezin ku li erdê bû xemgîn bû.
Wî tevdîr kir ku hemû yên afirandin wê ji rûyê erdê werin tune kirin – hem mirov û hem jî heywan.
…Lê dilê Xwedê bi zilamekî yek xweş bû.

"THE BIBLE EXPLAINED
IN EVERY LANGUAGE."





SUPERBIBLE.TV